DEPOZÎTA EWLEHIYÊ

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Depozîta ewlekariyê çi ye?

Dema hûn derbasî daîreyeke nû bibin, piraniya xwediyên xanî ji bilî **kirêya meha yekem** dê ji we **depozîtekê** jî bixwazin. Hin xwediyên xaniyan jî **kirêya meha dawî** pêşîn dixwazin. Hin tiştên din ên derbarê depozîtên ewlehiyê de divê hûn bizanin ev in:

Depozîta ewlehiyê bi gelemperî bi qasî **kirêya mehekê** ye, lê **ti sînorekî** heqê depozîtê **tune ye** ku xwediyê xanî dikare ji we bigire.

Divê xwediyên xanî depozîta ewlehiyê razînin **hesabekî bankê yê cuda**. Ger wisa nekin, ew nikarin depozîta we bigirin piştî ku we bar kir.

Xwediyê xanî **tenê** dikare depozîta we ya ewlehiyê ji bo **kirêya nedayî**, ji bo **dabînkirina xizmet û heqên gîştî** an jî ji bo **tamîrkirina ziyaneke** ku hûn an jî mêvanên we di daîreyê de bûne sedem di destê xwe de bigire.

Hin xwediyên xaniyan li şûna depozîta ewlehiyê heqê malbarkirinekê yê ku nayê îadekirin daxwaz dikin. Kontrata xwe ya kirêyê bixwînin û piştrast bin ku depozîta we îadebar e.

Divê ji ber "nûhîn û peritîna asayî" ji we pere neyê wergirtin.

Gelo pêwîst e ku ez du depozîtan bidim?

Heke hûn du xaniyan kirê nakin, na! **Heke xwediyê xaniyê we avahiyê bifiroşe**, **divê** depozîta we radestî xwediyê xaniyê we yê nû bike.

Heke hûn **daîreya xwe veguhezînin**, xwediyê xaniyê we dikare **depozîta we ya kevn veguhezîne** daîreya nû an jî **depozîta we ya ewlehiyê li we vegerîne** û **bike ku hûn yeka nû bidin**. Dibe ku pêwîst bike ku hûn depozîteke nû bidin **berî ku** hûn ya kevn bi şûn de bigirin.

Dema ku ez ji xanî derketim divê ez çi bikim?

60 roj beriya ku hûn derkevin...

- Dema ku hûn ê ji xanî derkevin, **kontrata xwe ya kirêyê bixwînin** da ku bibînin ka divê hûn çi bikin.
- Ji xwediyê xaniyê xwe re derbarê niyeta we ya derketinê de **maîlekê bişînin.** Navnîşana xwe ya nû bidin wan, ji wan daxwaza îadekirina depozîta xwe bikin û daxwaza kontrolkirina xanî bikin.

Berî roja we ya dawî...

- Deynê xwe yê wekî kirê û lêçûnên gîştî bidin.
- **Di dema kurttirîn de dest bi komkirina kelûpelên xwe bikin.** Zemînê paqij bikin, bimalêşin û tozê bigirin. Çop û zibilan di hundirê xanî de an li derdora wê nehêlin. Kontrolkirina dolaban, qatên jorîn, jêrzemînan û gerajan ji bîr nekin.
- **Kontrol û vekolanekê bikin.** Ji bo hûrgiliyên derbarê kontrolê de li paş vê rûpelê binêrin.

Roja ku hûn derdikevin..

- **Hemû tiştên xwe** ji milkê kirêkirî derxînin. Ger hûn tiştekî li dû xwe bihêlin, dibe ku heqê rakirina wan ji we were girtin.
- **Wêne û vîdyoyên** yekîneya vala **bikişînin.**
- **Kilîdên xwe teslîm bikin.**

KURDISH KURMANJI - Security Deposits KYR

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME

NHBA (615) 701-7957

AMAC American Muslim Advisory Council (615) 988-6460

NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER

ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revizekirin.

DEPOZÎTA EWLEHIYÊ

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Ez çawa dikarim depozîta xwe bi şûn de bigirim?

1. Di nav **4 rojên** piştî malbarkirinê de bi xwediyê xaniyê xwe re **kontrolkirina xanî plan bikin.**

2. Di dema kontrolê de, bi xwediyê xaniyê xwe re **lîsteyeke** xisaran û lêçûnên tamîrata van xisaran çêkin. **Heke xwediyê xaniyê we lîsteyeke mesrefan nede we, nikare depozîta we li ba xwe bigire.**

A. Heke hûn li ser **tiştekî** di lîsteyê de bi wan re li hev nekin, **li kêleka bendên ku hûn bi wan re li hev nakin "nîqaşbar" binivîsin** û **navê xwe îmze bikin.**

B. **Kopiyeke** lîsteyê **daxwaz bikin** an **wêneyê** wê bigirin.

C. Xwediyê xaniyê we dikare **pirsgirêkên din** ên ku bibîne jî lê zêde bike di nav **30 rojên** piştî derketina we ya ji xanî de. Heke kirêdarekî nû bikeve xanî, maweya 30 rojî dadikeve **7 rojan**.

3. **Navnîşana nû** ya ku hûn dixwazin depozît bo wir were şandin bidin xwediyê xanî.

4. Piştî ku hûn ji xanî derketin, ji xwediyê xaniyê xwe re **daxwazeke nivîskî bişînin** û depozîta xwe ya ewlehiyê bi şûn de bixwazin.

Heke xwediyê xaniyê we bibêje ku ew dest datîne ser qismekî depozîta we an temamê wê, divê hûn **di nav 60 rojan de** bersivê bidinê. Baştir e ku babetên ku hûn tevlî wan nabin û sedemên wan bi **nivîskî** (bo nimûne bi nameyekê an e-postayekê) bînin ziman. **Kopiyeke** bersiva xwe **hilgirin**.

Heke xwediyê xanî **dîsa jî** lîsteyeke mesrefan nede we an piştî şandina nameyê red bike ku depozîtê vegerîne, hûn dikarin **dozê** lê vekin.

Ger xwediyê xaniyê we depozîta we li we venegerîne, hûn dikarin wan bidin dadgehê.

Ji bo vekirina dozê, biçin navnîşana 408 Second Ave North, Nashville, TN. ya **Dadgeha Danişînên Giştî ya Davidson County** ya li **Avahiya Birchê**. Herin **Ofîsa Katipan** li qata duyemîn.

Ji bo destpêkirina doza xwe **serlêdana Wekaletekê bikin**. Hûn dikarin kopiyeke wê ji Ofîsa Katipan bistînin an jî hûn dikarin wê ji https://circuitclerk.nashville.gov/general-sessions-forms/ bidin nivîsin. Lînkê bitikînin ji bo Wekaletnameya Pro Se.

Ji bo vekirina dozê **xercek** heye. Heke hûn **nikaribin heqê wê bidin**, **Beyannameyeke Xizaniyê** bidin Ofîsa Katipan û bipirsin bê ka hûn dikarin **xercê nedin an na**. Ji bo ku hûn bizanin bê ka kengê doz ji xwediyê xanî re hatiye teblîxkirin û **danişîn** kengê dest pê dike, bi Ofîsa Katipan re **têkiliyê daynin**.

Di roja rûniştina xwe de, **biçin dadgehê**. **Delîlan** bînin û nîşan bidin ku hûn li gorî qaîdeyan tevgeriyane û xwediyê xaniyê we depozîto li we venegerandiye. **Delîlên xwe nîşanî dadger bidin û aliyên xwe yên çîrokê rave bikin.**
Şansê xwediyê xaniyê we jî dê hebe ku aliyên xwe yên çîrokê rave bike.

Li şûna ku biçin dadgehê, hûn dikarin vê yekê bi navbeynkariya Nashville Conflict Resolution Centerê jî bikin. Ji bo ku hûn bizanin ka çawa dibe, telefonî (615) 833-8400ê bikin.

KURDISH KURMANJI - Security Deposits KYR

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME | NHBA (615) 701-7957 | AMAC American Muslim Advisory Council (615) 988-6460 | NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER | ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekîtiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revîzekirin.